Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :414 nameronahi@gmail.com 16- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Xwezaya Kurdistanê berxwedêr e




Ji ber bombebarana dewleta Tirk a dagirker li gundê Kortekê û derdora wê şewat derket. Ji ber şewatê bi hezaran dar şewitîn û gelek heywan telef bûn.
Dewleta Tirk a dagirker ku qirkirinê li ser gelê Kurd ferz dike, 11'ê Hezîranê bi rengekî fermî eşkere kir ku wê dest bi operasyona dagirkirinê ya Başûrê Kurdistanê bike. Bêguman ev ne êrîşeke nû ye. Bi salan e dewleta Tirk bi her awayî êrîşê dibe ser têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd. Têkoşîn û berxwedana gelê Kurd a li dijî vê êrîşkariyê jî timî di asta herî bilind de hatiye kirin.
Mejiyê desthilatdar ê dewleta Tirk ne tenê êrîşî Tevgera Azadiyê ya gelê Kurd dike, hewl dide xwezaya Kurdistanê ya bi xêr û bêr jî talan û tine bike. Rejîma AKP'ê ji bo desthilatî û dîktatoriya xwe, jin, zarok, ciwan, extiyar û xwezaya li Kurdistanê dide ber xwe. Mînaka herî bi êş û berbiçav a vê yekê jî Solîna biçûk e ku tevî pênc ferdên malbata xwe bi rengekî hovane sala 2001'an li ser rêya Kortekê ji aliyê balafirên şer ên artêşa Tirk ve hate kuştin.

BI HEZARAN DAR ŞEWITÎN, HEYWAN TELEF BÛN

Dewleta Tirk a dagirker bi rêk û pêk her sal agir berdide xwezaya Kurdistanê. Berî niha bi çend rojan careke din êrîş bir ser derdora gundê Kortekê. Ji ber bomberdûmanê agir bi vê xwezaya mîna bihuştê ket û bi hezaran dar û zindiyên tê de şewitîn.
Şewatê du rojan li qadeke berfireh dewam kir ku heta gihîşt cihê bîrdariya ji bo bîranîna Solîna biçûk û malbata wê hatibû çêkirin. Û bi hewldanên şêniyên herêmê hate vemirandin. Dema ku me berê xwe da herêmê, me dît ku gelek lawir jî şewitîne. Heywanên ku ji şewatê rizgar bûne, bi biryardarî hewl didin li qada şewitî ji nû ve jiyanê biafirînin...*ANF*

## Ewlekariya hundurîn a Reqayê xurt dibe





Rêvebera Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê Xelye Hemûd axivîn û behsa xebatên parastina sivîlan ya din êrîş û tehdîdan de, kirin. Herdû rêveberan wiha gotin: "Me di Hêzên Ewlekariya Hundirîn de piştî ewqas sal gelek astengî û zehmetî derbaskirin û me teror bi hemû şêweyên wê li herêmê tune kir."
Hêzên Ewlekariya Hundirîn di 6'ê Hizîrana borî de gelek şaneyên terorê tune kir. Di 22'ê Hizîrana borî de jî piştî ragihandina rewşa awarte ji bo 5 rojan gelek şaneyên terorê bin çav kirin û gelek cebilxane desteser kirin.
Hêzên Ewlekariya Hundirîn li hember êrîş û tehdîtan soza parastina aramiya herêmê û sivîlan dan.
Piştî bi dawîbûna axaftinan endaman sond xwarin, paşê merasîm bi dawî bû.
Şehîd Xalid El-Hemûd yê ku dewre bi navê wî hate vekirin, ji şêniyên Reqayê ye û endamekî Hêzên Ewlekariya Hundirîn a bajêr bû. Dema bi erka xwe radibû li bajarokê El-Sehlebiyê yê gundewarên Reqayê di 9'ê Hezîrana derbasbûyî de şehîd bibû... *ANHA*

Dewreya 25'emîn a Hêzên Ewlekariya Hundurîn a Reqayê ku 230 endam beşdar bûn, bi merasîmekê bi dawî bû.
Rêveberên Hêzên Ewlekariya Hundirîn a bajarê Reqayê ku beşdarî merasîma bi dawîbûna dewrê bûn gotin, "Me piştî ewqas tehdîd, gelek astengî derbaskir û teror tune kir."
Rêveberên Hêzên Ewlekariya Hundurîn a bajarê Reqayê di merasîma bi dawîbûna dewreya şehîd Xalid El-Hemûd a endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn de axivîn.
Hêzên Ewlekariya Hundirîn xebatên xwe berfireh dike.
Merasîma dewreya 25'emîn a Hêzên Ewlekariya Hundirîn, bi tevlîbûna 230 endaman pêk hat.
Dewre, bi navê şehîd Xalid Hemûd li Akademiya şehîd Idrîs a navçeya Eyn Îsa ya Kantona Girê Spî hate lidarxistin.
Dewreyê 10 rojan dewam kir.
Endam li ser waneyên bîrdozî û leşkerî hatin perwerdekirin.
Di merasîmê de Rêveberê Ewlekariya Hundirîn a bajarê Tebqayê Îmad Hisên û

## Tevlêbûna ciwanan ya nava QSD'ê zêde dibe

Akademiya Şehîd Qendîl Selhebiye dewreya perwedeyê bi beşdarbûna 100 şervanên nû yên QSD'ê bi navê dewreya Reefet Reqa dest pê kir.
Dewereya Şehîd Reefet Reqa bi merasîmekê li Tebqa hate destpêkirin. Dewre bi beşdarbûna şervanên 2 focên leşkerî ku ji her focekê 50 şervan tevlî bûne, hate destpêkirin. Dewre wê 45 rojan dewam bike.
Hevserokê Desteya Parastinê yê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê Mihemed Xalid û fermandarên QSD'ê yên herêma Tebqa, her wiha hevserokên komîteyên meclîsa rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqa û Rêveberên Meclîsa Jinan a herêma Tebqayê beşdarî merasîmê bûn.
Di merasîmê de li ser navê Meclîsa Jinan a Tebqayê Fatma Hisên axivî. Fatmê dewre li hemû şervanan û şêniyên herêmê pîroz kir û sersaxî ji malbatên şehîdan re xwest û diyar kir ku bi saya tekoşîna şehîdan û şervanên QSD'ê destkeftî hatine bidestxistin.
Di berdewama merasîmê de Hevserokê Komîteya Parastinê yê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê Mihemed Xalid axivî û diyar kir pêwîste di rewşa Sûriyê ya heyî de avakirina hêzên leşkerî ji bo parastinê pêwîstiyeke û da zanîn ku şêniyên herêmê dikarin parastina xwe bikin û herêmên xwe birêve bibin.
Paşê sed şervanên ku beşdarî dewreyê bibûn soza leşkerî dan.
Di dawiya merasîmê de beşdaran xelekên govendê gerandin. Şehîd Refet Reqa di şerê rizgarkirina bajarê Reqayê de şehîd bû...*ANHA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 414 16 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Tecrîd gihiştiye asta herî bilind



Parêzer Raziye Tûrgût diyar kir, ji ber ku kiryarên li Îmraliyê li gelemperiya Kurdistan û Tirkiyê hatine belavkirin, bêhiqûqî û tecrîda li girtîgehan di nava 2 salên Rewşa Awarte de gelekî giran bûne û gihîştine asta herî bilind. Tûrgût got, "Piştî ku Birêz Ocalan hate girtin, rejîmeke înfazê ya xweser ava kirin. Ev yek bi demê re li girtîgehên din jî hate ferzkirin." *R-4*

# EFRÎN BUYE WEKE BAJAREKÎ BIYANÎ



### DAGIRKERAN JIYAN JEHR KIRINE

Li Efrînê roj bi roj jiyan dibe weke cehenem. Dagirker her roj li dijî welatiyên Efrînê kiryarên der mirovahî pêk tînin. Her roj li ser navê Efrînê ku Kurdan hebe dixwazin ji holê rakin. Mirovan direvînin, dikujin, dest datînin li ser malên wan, xwezaya Efrînê dişewîtinin û demografya herêmê diguhrînin. Herî dawî dagirkeran li gundê Aysko yê Şêrawa 7 ciwanên din revandin û êşkence li wan kirin.

### RÊ HEBE WÊ HER KES DERKEVE


Malbateke ku ji ber zilm û hovîtiya dagirkeran ji Efrînê revî û xwe gihand Şehbayê behsa kiryarên dagirkeran kir û wiha got, "Li Efrînê ew tehemula ku mirov lê bimîne û bijî tune ye. Gotin têra hovîtî û zilma li Efrînê dibe nakin. Li Efrînê guhertina demokrafîk êdî gelek eşkere xuya dibe, weke ku em li bajarekî biyanî bûn. Ger rê vekirîbe yek kes jî naxwaze li Efrînê bimîne." *R-5*

## Di MSD'ê de wê guhertin pêk werin



Kongreya Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê wê di 16'ê vê mehê de were lidarxistin. Endamê Desteya Rêveberiya Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Hikmet Hebîb bal kişand li ser girîniya kongreyê û diyar kir wê bi vê kongreyê guhertinên ku pêşeroja Sûriyê eleqeder bike, pêk werin." *R-4*

## Şandeya rewşenbîrên Misrê hat Rojava



Şandeyek ji rewşenbîrên Misrê ku ji lêkolîner, nivîskar û rojnamevanan pêk tê bi armanca ku rewşa herêmê bişopîne û bi taybetî sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji nêzîk ve nas bike,hat Rojavayê Kurdistanê. Şande wê li Rojava wekî mêvan tevlî Kongreya Meclîsa Suriya Demokratîk MSD'ê bibe. *R-4*

## Gelê Mexmûrê şehîdên 14'ê Tîrmehê bibîranî



Li Saziya Malbatên Şehîdan ya Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî, (Mexmûr) Şehîdên 14'ê Tîrmehê hatin bîranîn. Bi sedan kes ji şêniyên kampê beşdarî bîranînê bûn. Ji rêveberên kampê Mistefa Cizîrî li ser wateya rojê axivî û diyar kir ku divê Kurd li her derê li dijî faşîzmê li ber xwe bidin. *R-5*

## Xwepêşandanên li Iraqê berdewam dikin



Ev zêdeyî hefteyeke gelê bajarê Besrayê yê Iraqê bi sedema kêmbûna ceyran û xizmetguzariyê di xwepêşandanê de ne. Heta niha bi sedan kes di xwepêşandanan de birîndar bûne. Xwepêşandan berbelavê bajarên din yên weke Bexda, Necef, Kerbela, Mîsan û Zîkarê bûn jî. *R-5*

## Îran û Tirkiye bi hêsanî ji Sûriyê dernakevin *R-4*

## Hevdîtina Trump û Putin *R-5*

## Em bi hev re li ber îdamê rabin



Girtiya siyasî ya Kurd Zeynep Celaliyan nameyek ji girtîgehê şand, işaret bi cezayê darvekirinê yê li Îranê kir. Celaliyan bang kir û got, "ez weke girtiyeke ku bi salên dirêj li bin cezayê darvekirinê me, ez daxwazê ji we hemûyan dikim ku em hemû bi hev re li ber cezayê darvekirinê rabin. *R-3*

## Ezê laçika spî ji bo aşitiyê timî bidim serê xwe



Parlamentera HDP'ê Remziye Tosun ji ber ku bi laçika xwe ya spî sond xwar mohra xwe li pêvajoya sondxwarina li Meclîsa Tirkiyê da. Remziye wiha got, "Ez şahidê zindî ya hemû qedexe, şer û wêrankirina li Sûrê me. Ji bo vê jî heta ku ez bijîm ez ê laçika xwe ya spî ji bo aştiyê bidim serê xwe." *R-3*

## Em nikarin ji Ocalan agahiyê bigirin

Hevberdevka HDK'ê Gulîstan Kiliç Koçyîgît di 4. Civîna Meclîsa giştî ya Serdema 8. a HDK'ê de bal kişand ser tecrîda li Îmraliyê û got, "Li ser Birêz Ocalan tecrîdeke giran heye ku destûr nayê dayin parêzer û malbata xwe bibîne. Ji bilî hevdîtineke malbatê, ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve agahî ji Ocalan nayê girtin. Li ser tenduristî û ewlekariya wî em nikarin agahiyê jê bigirin." *R-3*

## Heta êrîş hebin wê berxwedan jî hebe



Çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê di roja 36 an de dewam dike. Ji Silêmanî, Helebce, Çemçemal, Mexmûr, Raperin, Kerkûk ciwan çûn Qendîlê û serdana çalakiya Mertalên Zindî kirin. Ciwanan daxuyanî dan û diyar kirin heta ku êrîş hebin wê berxwedana wan jî berdewam bike. *R-5*

## Pêwîstiya civakê bi komînan heye



Girîngiya komînan roj bi roj hê zêdetir derdikeve holê û civak jî pêdiviyê bi avakirina komînên nû dibîne. Bi arambûna taxa Şêxmeqsûd ya Helebê gel li dora komînan xwe bi rêxistin dike. Bi vê armancê welatiyên taxa Şêxmeqsûd komîneke nû ava kirin. *R-6*

## Li Xezayê li hev hatin pêk hat




Hate ragihandin ku li Xezayê Îsraîlê û rêxistinên Fîlîstînî li hev kirine. Rêxistina Hamasê û Cîhada Îslamî piştrast kirin ku bi Îsraîlê re li hev hatiye kirin. Li gorî daxuyaniyên her du rêxistinan, lihevkirin bi hewldanên Misrê pêk hatiye. Li ser naveroka peymanê heta niha agahiyeke zelal nehatiye dayin. *R-2*

## HPG'ê lê da, 16 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li Colemêrg, Wan, Şirnex, Sêrt, Qers, Bedlîs û Amedê daxuyaniyeke nivîskî weşand. HPG'ê ragihand ku di çalakiyan de 16 leşkerên Tirk hatine kuştin. HPG'ê diyar kir ku sê gêrîlayên wan jî li Amedê şehîd bûne. *R-2*

## Koma ku çek dida DAIŞ'ê hat girtin



Navenda Ragîhandinê ya Hêzên Ewelekariya Hundirîn a Reqayê daxuyanyek da û diyar kir ku li Reqayê komeke ku çek û cebilxane didan şaneyên razayî yên DAIŞê û hatin girtin. Hat ragihandin ku koma mijara gotinê ji 7 kesan pêk tê û li ser wan miqdarek mezin çek û cebilxane yên cûrbecûr hate girtin. *R-2*

## Leşker ji tirsa nikarin serê xwe rakin

Êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li ser başûrê Kurdistanê berdewam dikin. Leşkerên Tirk yên ku li herêma Biradost bi cih bûne newêrin serê xwe ji çeperên xwe derxînin. Gerîlla her roj li dijî wan çalakiyan dikin. Gêrîllayên li herêmê wiha gotin, "Leşkerên Tirk heta niha ji bejahî ve bi pêş ve neçûne û dewleta Tirk nikare ji bo wan tiştekî bişîne." *R-4*

# Li Efrînê her roj sivîl tên revandin

**_Li Efrînê zilm û zordariya dagirkeran ya li ser gel bê navber berdewam dike. Artêşa Tirk a dagiker û çeteyên wê li Efrînê her roj sivîlan direvînin. Hate ragihandin ku herî dawî li Şêrawayê 7 welatiyên sivîl ên din, ji aliyê çeteyên artêşa Tirk ve hatine revandin._**



Artêşa Tirk a dagiker û çeteyên wê li Efrînê her roj sivîlan direvînin. Hate ragihandin ku herî dawî li Şêrawayê 7 welatiyên sivîl ên din, ji hêla çeteyên artêşa Tirk ve hatine revandin.
Li gorî çavkaniyên herêmî ragihandî, çeteyên Firqet El-Hemzat ên girêdayî artêşa Tirk a dagirker, li gundê Aysko yê navçeya Şêrewa ya girêdayî Efrînê 7 ciwan revandine. Hate ragihandin ku ciwanên hatî revandin birine cotgeha gund û li wir êşkence li wan kirine.
Navê ciwanên ku hatî revandin wiha ye: Omer Îbo (25), Hesen Bazo (19), Mihemed Hesen Ibrahîm (23), Welîd Haydar Ilkilo (38), Omer Cûma Eloko (30), Omer Nazo (31) û Ebdo Xoce (35).

## Bi sed hezaran kes ji bo girtiyan daketin qadan



Li Katalonyayê bi sed hezaran kes ji bo Carles Pûîgdemont û lîderên wan ên li girtîgehan daketin qadan. Bi banga siyasetmedarê Katalan ê li Elmanyayê dîlgirtî Carles Pûîgdemont, bi sed hezaran kes bi daxwaza azadiyê li Barselonayê daketin qadan.
Katalanan xwestin, bi dehan siyasetmedarên ku piştî referandûma Serxwebûna Katalonyayê ya Cotmeha 2017'an hatin girtin, bên berdan. Xwestin ku di serî de Pûîgdemont, siyasetmedarên din ên li sirgûnê karibin vegerin welatê xwe.
Serokê Herêma Katalonyayê Joaqûîm Torra û gelek siyasetmedar, hunermend û sporvanên Katalan jî tevlî xwepêşandana mezin bûn.
Katalonyayê piştî referandûmê 27'ê Cotmeha 2017'an serxwebûna xwe îlan kiribû, lê belê hikumeta navendî ya Spanyayê bi xala 155'an a destûra bingehîn re hemû saziyên xweser ên Katalonyayê betal kiribû û biryara hilbijartina pêşwext dabû. Gelek siyasetmedar hatibûn girtin û tevî Pûîgdemont hinek siyasetmedar jî neçar mabûn berê xwe bidin sirgûnê. Di hilbijartinên pêşwext ên 21'ê Kanûna 2017'an de partiyên alîgirê serxwebûnê careke din bi ser ketibûn.

## Koma ku çek dida DAIŞ'ê hat girtin



Li Reqayê komeke bazirganan ku çek û cebilxane didan şaneyên razayî yên DAIŞê û hatin girtin. Bi çekên vê komê kes dihatin kuştin, her wiha ewlekariya herêmê dihate binpêkirin. Bi komê re miqdarek mezin çek û cebilxeneye hate girtin.
Navenda Ragîhandinê ya Hêzên Ewelekariya Hindirîn a Reqayê derbarê bûyerê de daxuyanî da.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayîn: "Alava Ewlekariya Hindirîn beriya çed rojan komeke bazirgan ku têkiliya wan bi aliyên ewlekarî û aramiya herêmê binpê dikirin re hebûn girtin. Her wiha miqdarek mezin çek û cebilxaneya di bajarê Reqayê de li gel wan bûn, hate destserkirin.
Di vê derabrê de Fermandarê beşê çalakiyên ewlekariyê û berpirsê dosya koma hatiye girtin, diyar kir wan di riya çavkaniyên xwe yên taybet re hemû agahiyan li ser koma behsa mijarê bidest xistine û hate zanîn ku ev endamê komê çekan ji şaneyên teroristan re derbas dikirin. koma behsa mijarê ji 7 kesan pêk tê û li gel wan miqdarek mezin çek û cebilxane yên cûrbecûr hate girtin.
Berpirsê çalakiyê her wiha da zanîn ku gelek çek ji bo êrîşan hatibû amadekirin, hin çekên din endamên komê li ser temîrkirina wan kar dikirin û parçe ji wan re kom dikirin, alavên temîrkirina çekan jî li gel wan hebû."…*ANHA*

## HPG'ê lê da, 16 leşker hatin kuştin




Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li Colemêrg, Wan, Şirnex, Sêrt, Qers, Bedlîs û Amedê daxuyaniyeke nivîskî weşand. HPG'ê ragihand ku di çalakiyan de 16 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ev agahî par ve kir;
Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê hêzên me li dijî artêşa TC'ê ya dagirker çalakî kirin. Berfirehiya çalakiyê wiha ye;
14'ê Tîrmeê saet 04.30'An hêzên me li Şirnexê bi ser qereqola TRT Gabarê de girtin. Di çalakiyê de hêzên me ji du baskan ve li kozikan reşandin û 2 leşkerên dijmin di encamê de hatine kuştin.
14'ê Tîrmehê li Sêrt Berwarî, dema ku wesayiteke zirxî ya artêşa dagirker a TC'ê ber bi qada Çemê Karê ve diçû, hêzên me saet 11.15'an çalakiyeke sabotajê li ser kirine. Di vê çalakiyê de wesayiteke zirxî ya kobra hatiye rûxandin û 8 leşkerên dijmin hatine kuştin.
Ev pêlek e artêşa dagirker a TC'ê li Qers Qaxizmanê li qada Madûrê hewl dide ku yekîneyên veşartî bi cih bike. Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Serfiraziyê hêzên me 13'ê Tîrmehê saet 21.30'an li dijî yekîneyeke xef ku dihate xwestin li qadê bi cih bibe çalakiyeke sabotajê kirin û di encama vê de 2 leşkerên dijmin hatine kuştin.
12'ê Tîrmehê artêşa TC'ê ya dagirker li Bedlîsê, li qada Şêx Cuma operasyonek dane destpêkirin. Heman rojê berê sibehê hêzên me yekîneyeke operasyonê kirin jêr kontrola xwe û çalakiyek li dijî wan kirin. Di çalakiyê de ji du baskan ve li yekîneyên dijmin hate reşandin û 4 leşker hatin kuştin. Operasyon heman rojê ber bi nîvro ve ji qadê vekişiya.

### LI AMEDÊ 3 HEVALÊN ME ŞEHÎD BÛN

10'ê Tîrmehê artêşa TC'ê ya daigrker bi desteka amûra hewayî ya bêmirov li Qulpê ya Amedê li qada Şehîd Kawa operasyonek da destpêkirin. 11'ê Tîrmehê saet 01.30'ê balafiren şer û helîkoptêrê êrîşê qada yekîneyeke me ya li ser peywirê bombe kir. Di bombekirinê de 3 hevalên me şehîd bûn.

## Li Xezayê li hev hatin pêk hat



Hate ragihandin ku li Xezayê Îsraîlê û rêxistinên Fîlîstînî li hev kirine. Ev daxuyanî ji aliyê Fîlîstînê ve hate dayin.
Rêxistina Hamasê û Cîhada Îslamî piştrast kirin ku bi Îsraîlê re li hev hatiye kirin. Li gorî daxuyaniyên her du rêxistinan, lihevkirin bi hewldanên Misrê pêk hatiye. Rêxistinên Fîlîstînî wekî din diyar kirin ku wê bersivê bidin êrîşan. Lê belê li ser naveroka peymanê heta niha agahiyeke zelal nehatiye dayin.
Îsraîlê jî ragihandibû ku zêdeyî 40 nuqteyên Hamasê yên li Xezayê hatine bombekirin. Ji ber êrîşê 2 Fîlîstîniyn jiyana xwe ji dest dan.
Serokwezîrê Îsraîlê Netanyahû pêr daxuyaniyek dabû û gotibû, "Me biryar dan ku li dijî Hamasê operasyoneke xurt bikin."
Ji ber roketên ji Xezayê ber bi başûrê Îsraîlê ve hatin avêtin gelek kes birîndar bûbûn.

## Xwendekara Kurd, kuştî hate dîtin



Xwendekara Kurd a bi navê Meryem Ferecî ku li Tahranê rûdinişt û berî 9 rojan winda bibû, cenazeyê wê şewitandî hate dîtin.
Li gorî nûçeya kampanya parastina girtiyên siyasî û medenî, êvara 13 tîrmehê polîsên Tahranê cenazeyê jinek ku hatî şewitandin dîtin û piştî encamên testa DNA'yê derket ku cenaze yê xwendekara Kurd Meryem Ferecî ku berî 9 rojan li Tahranê winda bibû ye.
Ferecî di dema xwepêşandanên dawiya sala borî û destpêka 2018'ê li Îranê rû dan de, hatibû binçavkirin. Di Nîsana îsal de ji aliyê Dadgeha Şoreş a Îtlaata Îranê ve 3 sal cezayê girtîgehê û 2 sal jî cezayê qedexeya çûna derveyî welat lê hate birrîn. Piştre bi şertê girtina bi kontrol hate berdan.
Parêzerê Meryem Ferecî, Mihemed Hisên Axasî jî di 12'ê Tîrmehê de li ser hesabê xwe yê taybet Twîtterê belav kiribû ku hefteyeke Ferecî ji malê deketiye û ti agahî jê nayên girtin. Axasî diyar kiribû ku metirsiya kuştina Ferecî heye.
Meryem Ferecî xwendekarek Kurde û temenî 33 sale û xelkê Serpal Zehawî ya girêdayî Kirmaşana Rojhilatê Kurdistanê ye. Ferecî li Tahranê di şîrketekê de kar dikir.



# Divê em rêber Apo azad bikin

**_21'emîn Festîvala Ciwan, Çand û Sporê ya Mazlûm Dogan a yek ji organîzasyonên herî mezin ên ciwanên Kurd ku li Ewropa weke çandekê her sal tê lidarxistin, bi tevlîbûna bi sedan ciwanan li bajarê Dan Haag ê Hollandayê hate lidarxistin._**






21. Festîvala Ciwanan a Mazlûm Dogan pêk hat
21. Festîvala Ciwan, Çandû Sporê ya Mazlûm Dogan, li bajarê Dan Haage ê Hollandayê pêk hat.
Festîvala ku Ciwanên Azad û Jinên Ciwanên Azad organîze kirî, li bajarê Den Haag ê Hollandayê bi dirûşma "Li dijî faşîzmê serî hilde, Serokatî azad bike" hate lidarxistin.
21'emîn Festîvala Ciwan, Çand û Sporê ya Mazlûm Dogan a yek ji organîzasyonên herî mezin ên ciwanên Kurd ku li Ewropa weke çandekê lê hatiye her sal tê lidarxistin, bi tevlîbûna bi sedan ciwanan li bajarê Dan Haag ê Hollandayê hate lidarxistin.
Festîval bi meşeke bêhmepa ya bi flamayên PKK'ê û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan destpê kir. Piştre bi sirûda Çerxa Şoreşê ji bo şehîdan deqeyekê rêz hate girtin.

### DIVÊ EM RÊBERTÎ AZAD BIKIN

Di festîvalê de li ser navê Ciwanên Azad Şoreş Andok axivî:
Şoreş wiha ev tişt anî ziman, 'Di şexsê rêberê mezin ê berxwedana zindanê Mazlûm Dogan de em hemû şehîdên Kurdistanê û şehîdên şoreşa cîhanê bi bîr tînin û li ber wan bejna xwe ditewînin. Fermandarê mezin ê Berxwedana Xwerêberiyê Çiyager û lehenga fedaî ya Berxwedana Efrînê Avesta Xabûr vê pêvajoyê pêşengên ciwan in. Xwedîderketina li bîranîna wan bi şikandina tecrîda li ser Rêber Apo pêk tê. Bi vê çarçoweyê ciwan li dijî faşîzmê divê serî rakin û Rêbertî azad bikin."
Her wiha Komalên Ciwan jî peyameke dîtbar ji ciwanên Kurdistanî û enternasyonalîst re şand.
Bi çarçoweya festîvalê niha maça dawî ya turnuvaya futbolê tê lîstin. Fînalîst Veger Umut Elmanya û Kurd Potsdam ji bo bîranîna festîvalê ji bo kupaya şampiyoniyê dilîzin. Piştî lîstika gokê wê konserek çêbibe.
Di festîvalê de peyama bi dîmen a Komelên Ciwan hate nîşandan.
Di aktivîteya sporê ya festîvalê de di navbera tîmên futbolê ya fînalê ya navbera Veger Ûmût Elmaya û Kurd Potsdamê de hate lîstin. Tîma Kurd Potstam 5-2 ser ket.
Festîval piştî lîstika futbolê bi hunermendên ku konserê bidin û aktivîteyên cihê dom kir.
Di festîvalê de Muharrem, Madî, Koma Reqsê ya Îrland, Tîmên şanoyê, Koma Çarnewa û Koma Zelal derketin ser dikê.
Govendên li ber stranana hatin gerandin bê navber dirûşmên "Bijî Serok Apo", "Bê Serok Jiyan Nabe", "Bijî Partiya Karkerên Kurdistan" û" Jin, Jiyan, Azadî" hatin qîrkirin.
Di festîvalê de li gel konser, çalakiyên cihê jî hatin nîşandan. Lîstikên mîna Stranc, boks, turnuvaya futbol û voleybolê hatin kirin. Jinên ciwan di nava xwe de turnuvayeke ya volebolê lidar xistin. Qada voleybolê di tevahiya festîvalê de eleqeyek mezin dît.
Ji bo zarokan jî qadên lîstikê yên taybet hatibûn amadekirin.
Festîval bi dirûşman ve bi dawî bû…*ANF*

## Helbesta yekê li ser keda jinê nivîsandiye



Jina Helbestvan Starê Ebdê ya ji Bajarê Hesekê ji 15 saliya xwe heta niha helbestan dinivîse û dibêje dema ku ew helbestan dinivîse di dilê xwe de jiyanê bi rih dike.
Jina Helbestvan Starê Ebdê 42 salî û ji Hesekê ye. Ew ji 15 saliya xwe heta niha helbestan dinivîse û di heman demê de mamoste û endama rewşenbîran e. Starê anî ziman ku ew di helbestên xwe de ked, dîrok û rastiya jinê radixîne pêş çavan.
Starê Ebdê da zanîn ku wê helbesta xwe ya yekem li ser ked û rola dayikan nivîsandiye û got: "Ez bi evînek mezin helbestan dinivîsim. Dema ku ez dinivîsim bêhna min fireh dibe. Ez hem mamostetiyê dikim hem jî karê xwe yê nivîsandinê didomînim. Ez girîngiyek mezin nîşanî keda jinê û rola jinê ya di jiyanê de, didim. Loma helbesta min a yekem li ser keda dayikan e. Min xwest ez bi helbesta xwe peyamekê bidim civakê ku rola jinê çiqas girîng e. Jin hem zarokên xwe mezin dikin, hem karê xwe dikin her wiha çand û hunera xwe diparêzin. Loma divê her dem li dijî keda jinê rêzdarî bê nîşandan."

### JIN AFRÎNER IN

Starê bal kişand ser afirîneriya jinê ya di jiyanê de û wiha dewam kir: "Du dîwanên min ên helbestê hene. Min dîwanek bi zimanê Erebî yek jî bi Kurdî amade kiriye. Çimkî ez girîngiyê didim zimanê dayika xwe. Gelek helbestên min hene ku min derbarê jinê de nivîsandiye. Çimkî min di heman demê de feyz ji afirîneriya jinê girtiye. Jin her dem afirîner in. Ji ber ku zihniyeta baviksalarî her dem keda jinê binax kiriye loma min xwest ez dîrok, ked û nasnameya jinê di helbestên xwe de derxim pêş."

### HELBEST ÇEKA HERÎ XURT E

Starê da zanîn ku çeka herî xurt a helbestvan, helbest e û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Helbestkar bi helbestên xwe li dijî desthilatdar, dagirker û mêtingeran şer dikin. Loma ew jî her dem êrîşî helbestkaran dikin. Taybetmendiya helbestkar jî ew e ku di helbestên xwe de rastiyê derxe pêş û di heman demê de civakê hem hişyar hem jî perwerde bike. Ez ê di siberojê de berhemek bi navê 'Kevoka Spî' çap bikim. Di vir de jî dîsa ez ê ramanên jinê derxim pêş. Jin bi fikir û ramanên xwe yên azad xweşik in."…*Ronîda Hacî /Hesekê*

## Bêjing bi sedan salin bi destê jinê tê parastin



Li gundan dema bêjingkirina zad e. Li gundê Sêdeqnê yê girêdayî navçeya Farqînê jinên gund ên ku piştî nok li bênderê li ba xistin û ji kayê derxistin, li dora cêza nokan kom bûne û bêjing dikin.
Li gund û gundewarên bajar û navçeyên deştê demsala çinînê ye. Yek ji çanda herî qedîm jî bêjingkirina genim, ceh, nîsk û nokan e. Cotkar piştî zadên xwe diçinin, li zeviyan hişk dikin, li bênderan berhev dikin û gêre dikin. Li gundê Sêdeqnê ya girêdayî navçeya Farqîna Amedê jî piştî welatiyên gund nokên xwe li bênderê gêre kirin, li ba dixin û ka û nokan ji hev cuda dikin. Piştî cêz û loda nokan li ber malên xwe vala kirin vê carê cêzê li serad û bêjingê dixin. Çend dayikên ji gund jî li hev kom bûn û loda nokan bi zibareyî bêjing kirin. Dayik bi hezkirinek mezin nokan bêjing dikin. Ev dîmen û wêneyên li gund hatin kişandin çanda sedan sal a çandiniyê bi bîra mirovan dixîne…*MA/Farqîn*



## Pêvajoya têkoşîna zimanê dayikê li Flander

Derwêş M. FERHO

J.J. Jones ku ji bo têkoşîna zimanê Gallerî gellek ked daye ji bo gelê xwe wiha gotiye: "……. Hun ji welatê xwe dûr nakevin lê welatê we we terk dike. Ji bin lingên we dişemite, ji we dûr dikeve. Ji aliyê bayekî ve tê li ber xwe dibe û dikeve destê çanda gelekî din."
Şerrê duyemîn yê cîhanê nakokiyên di navbera civata Frensîaxêv û Flamanî/Hollandî axêvan de kûrtir dike. Dezgehên dewletî û hikûmet di destê Frensizan de ye. Xwe xwediyê Beljîka û biryarên bingehîn dibînin. Di heman demê de belavbûna tevgera Flamanan jî hêza wan lawaz dikir. Hevkarên rayedarên dewletê di nav Flamanan de bi destxistiyên herî kêm razî ne, beşa din hemû mafên ku Frensiz xwedî ne ji gelê xwe re jî dixwazin. Rayedarên dewletê û hevkarên wan yên Flaman ev beşa duyemîn bi cudaxwaziyê tewanbar dikir.
Flamanan yekemîn partiya siyasî bi navê Frontpartij (Partiya Eniyê) di 1919 de bi gelek dijwariyan ava kir. Hem partî hem komên din xebata ziman bê rawestan meşandin.
Rayedarên dewletê jî bi hemû hêza xwe siyaseta asîmîlekirinê pêk dianîn. Di sala 1921 de rêbazeke herêmî hat qebûlkirin, lê dîsa ji Flamanan re ne li gor pêdiviyan dihat dîtin. Mînak, Bruksel di nava herêma Flander de ye, lê ziman û jiyana Frensizî bû rastiyek. Hêza dewletî hemû rê li ber zimanê Flamanî digirt. Flamn wek gel piçûk dihatin dîtin, zimanê wan jî yê gundiyan duhate qebûlkirin.
Flamna ji xwe re li derfetan geriyan, dîtin û xistin jiyanê. Gav bi gav, li bajar û gundên flamanan dibistanên bi zimanê dayikê perwerde didan peyda bûn. Lê xwendina bilind bi Frensizî bû û ev jî dibû sebeba gelek astengiyên xwendekarên Falaman.
Cara yekê ye ku di 1923 de zanîngeha Gent destûreke qismî (teng) stend ku bi zamanê dayikê perwerdê bike. Ev bes nebû, lê gavek ber pêkanîna hêviya mezin bû. 10 sal paşê destûra ku Flamanan dixwest hate pejirandin û zanîngeha Gent bi temamî bi zimanê dayikê perwerda xwe pêk anî.
Ji sedema ku hin ji hêzên Flaman di dema şerrê duyemîn yê cîhanê de aliyê Almanan girt têkoşîna Flaman di qada ziman de jî kete bin gelek zextan. Dewleta ku rayedarên Frankofon bi hêz in, temamiya Flamanan kire bin konê tewanbariyê. Li cem ziman, nakokiyên di qada civakî, kultûrî û aborî jî hê kûrtir bûn. Di nav van gengeşiyan de Flaman partiyeke xwe nuh ava dikin: Volkunie (Yekîtiya Gel, 1954 ). Pirsgirêka ziman, aborî, civakî û rûhê Flamanî zindî kirin. Pê re pê re hêza aborî ji Wallonië (aliye Frensiz) ber bi Flander ava dibe. Ji 1960 û paş ve, gav bi gav sîstema federalîzmê li Beljîka dane qebûlkirin. Beşek ji şahredarên Flaman bi dirûşmeya: Ev herêm Flaman e û perwerde û jiyan divê bi Flamanî be siyaset xurt kirin. Lê Frensizan ji destpêkê ve siyaseta asîmîlasyonê hewqasî bi hêz kiribûn ku di vê xebatê de tengasî dikşandin. Bi taybetî Bruksel li ber şek û pekan heliya bû. Ev pirsgirêk heta roja îro jî heye.
Ji salên 60î ve Flamanan di çarçeweya zagonê de zimanê xwe dan pejirandin. Di fermiyetê de Flamanî li Flander, di nava Beljîka de li cem Frensizî, zimanê jiyanê û perwerdê ye. Lê çend bajar û gundên wan bi teybetî li herêma Brukselê statuya taybetî stendin ku gel xwedî biryara bikaranîna yek ji du zmanan be.

# Pêwîstiya civakê bi komînan heye

**Girîngiya komînan roj bi roj hê zêdetir derdikeve holê û civak jî pêdiviyê bi avakirina komînên nû dibîne. Bi arambûna taxa Şêxmeqsûd ya Helebê gel li dora komînan xwe bi rêxistin dike. Bi vê armancê welatiyên taxa Şêxmeqsûd komîneke nû ava kirin.**







Şêniyên taxa Xerbî ya Şêxmeqsûd a Helebê bi hejmarek zêde vedigerin taxê, ji ber vegera zêde ya welatiyan komînek nû li taxê bi navê şehîd Riyad El-Erneb hate avakirin.
Piştî aramiya herêmê gelek şênî vegeriyan taxa Şêxmeqsûd û hejmara niştecihên taxê zêde bûn. Bi armanca avakirina komînek nû ji taxa Xerbî re civîn ji şêniyan re hate li dar xistin.
Bi sedan şênî beşdarî civînê bûn. Di civînê de Endamê Rêveber ê TEV-DEM'ê Sebrî Efrîn axivî û girîngî û armanca komînan anî ziman û wiha got: "Ji ber vegera şêniyan ji taxê re û zêde bûna hejmara wan pêwîstî bi avakirina komînek nû li taxê hebû."
Sebrî Efrîn diyar kir ku ji bo pêşkeşkirina xizmetê ji şêniyan re û ji bo xurtkirina rêvebirina û rêxistinkirina komînê, hevserokên komîn û endamên wê bi riya hilbijartinên azad wê werin hilbijartin.
Di civînê de hilbijartina hevserokên komîna şehîd Riyad El-Erneb pêk hat.
Şêniyan Husam Reşîd û Elîfe Nezîr weke hevserokên komînê hilbijartin û endamên komîteyên (lihevanînê, perwerde, aborî, xizmetguzariyê, parastin û tendrûstiyê) hatin avakirin…
*ANHA*

# Guh nedin bangên xapînok



**Idrîs HENAN**

Mesûd Hesen ji gundê Moseka yê girêdayî herêma Raco ku beriya demekê ji herêma Şehbayê vegerîbû Efrînê, ji ber kiryarên leşker û çeteyên dewleta Tirk careke din ji Efrînê reviya.

**DERIYÊN MALAN DIŞKÎNIN**

Hesen destnîşan dike ku piştî êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê ji Efrînê bi mecbûrî derket. Bi qasî du mehan li herêmên Şehbayê ma. Lê di encama têkîliyên xwe bi hundir re ku her digotin; tiştek nîne, vegerin, rewş baş e! Hesen tê xapandin û tevî jin û du zarokên xwe vedigere gundê Moseka yê girêdayî herêma Raco. Hesen dibêje; çawa me nêzîkî li Efrînê kir leşker û çeteyên dewleta Tirk mobailên me girtin û em qewitandin. Hesen dewam dike; piştî ku em ji noqteya leşker û çeteyan bi qasî çend seatan bi dûr ketin, bi qaçaxî em derbasî gund bûn. Lê di heman rojê de leşker û çeteyên dewleta Tirk êrîşî gundê me kirin û deriyên malan bi pehînan şikandin. Ji bo ku gund vala bikin bê serûber gule direşandin. Hesenê wê çaxê têdigihêje ku ew hatiye xapandin û roja din direve bajarê Efrînê.

**MÛÇE NABIN, MAL DIDIZIN**

Li wir jî hesen bi riya hinek kesan li serwîsekê siwar dibe ku dibin bajarê Ezazê. Ji wir diçe Ceralblus û piştre jî Minbicê. Hesenê xapandî piştî ku şeva xwe li Minbicê diqedîne derbasî Helebê dibe û ji wir jî tê Şehbayê. Hesen radigihîne ku ev pêvajoya wî ya çûn û hatinê bi qasî 20 rojan ajot. Têde zêdeyî 200 Hezar lîreyên sûrî xerc kiriye.Hesen tekez dike ku li gundê wan li kêleka leşkerên dewleta Tirk çeteyên Hemzat, Firqeya Nehemîn û gelek komikên dîtir dizî û talaniyê dikin û dibêje: çeteyan ji me re gotiye dewleta Tirk mûçeyên me biriye, em jî her we bigirin û pereyên we bibin.

**AVEKÊ JÎ HÛN NIKARIN VEXWIN**

Dawiyê de Hesen bang li şêniyên Efrînê dike û dibêje: Guh nedin bangên xapînok. Mirovê di bin nîrê dagirkeriyê de nikare bi serbestî bijî. Tişta li ser erdê diqewime naşibe gotinan. Mirov di bin siya dagirkeriyê de nikare avekê jî bi azadî vexwe.

# Bi erzanbûna sebzeyan sûk geş bûn



Piştî destpêkirina mewsîma berhevkirina sebzeyan li Eyn Îsa, buhayê sebzeyan nîvenîv daket û vê yekê jî hişt ku bazarên herêmê geş bibin. Şêniyên herêmê ji ber erzanbûna buhayên sebzeyan kêfxweşiya xwe anî ziman.
Bi destpêkirina mewsîma berhevkirina sebzeyên havînê re li herêma Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî, buhayên sebzeyan bi rêjeya ji sedî 60 ji mehên berê kêmtir bû. Sedema kêmbûna buhayê sebzeyan ew e ku pir hatine çandin.
Li herêmê gelekî sebze tê kirîn û firotin, ji ber ku buhayê sebzeyan erzan bûye û ji bo veşartina zivistanê bi rêya kîsên veşartinê bi kêr tê. Her wiha sebze bi başbûna xwe ya tendurist tên zanîn.
Xwediyên firoşgehan û şênî didin zanîn ku buhayê sebzeyan gelekî erzan bûye û ne wekî mehên borî ye.
Di demên berê de buhayê firingiyan digihîşt 300 LS (lîrayên Sûriyeyê) lê di demên dawîn de heta 125 LS'yan daketiye.
Erebeyên tijî sebze her roj berê xwe didin bazarên navçeyê da ku cotkar berhemên xwe bifiroşin û ev yek dihêle ku tevgera sûkê bi rengekî giştî zêde bibe.
Di vê derbarê de cotkarê bi navê Siûd El-Ebdûlah da zanîn ku şêniyên gundewaran debara xwe, xwe bi xwe dikin û çandina sebzeyan di erdê wan bi xwe de dihêle û ku bi buhayê herî kêm bifiroşin.
Xwediyê firoşgeha sebzeyan Nayif El-Şewîn jî da zanîn ku buhayê sebzeyan erzan bûye, ji ber ku cotkaran dest bi berhevkirina sebzeyên havînê kiriye.
Welatiyên bi navên Mihemed El-Îsa û Ebdurezaq El-Ismayîl jî da zanîn ku sebzeyên li bazarê tên peydakirin, buhayê wan kêm e û bi xwe jî baş in…*ANHA*

# Rêxistinên mirovî erka xwe pêk naynin



Endamê rêveber ê Buroya Rêxistinan a Meclisa Sivîl a Reqayê Tirkî El-Dendel hemû rêxistin û komeleyên ruxset girtine û li Reqayê kar dikin, rexne kirin û got ku hejmara rêxistinan li Reqayê zêde bûye, lê alîkariyên pêwîst nadin welatiyan.
Piştî bajarê Reqa ji aliyê şervanên QSD'ê de ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin, rêxistin û komeleyên alîkariyan ên ruxset ji Meclisa Sivîl a Reqayê girtine, zêde bûn.
Endamê Rêveber ê Buroya Rêxistinan a Meclisa Sivîl a Reqayê Tirkî El-Dendel derbarê kar û xebatên wan rêxistinan de axivî û diyar kir ku hejmara rêxistinan zêde bûye, lê wekî tê xwestin erka xwe pêk naynin.
El-Dendel, da zanîn ku hejmara rêxistinan derdora 43'yan e, lê di pratîkê de tenê 4 an jî 6 rêxistin hene û kar dikin û ev tişt anî ziman: "Tevî rêxistinên behsa mijarê ruxsetên xwe li gel Meclisa Sivîl a Reqayê çêkirin, lê bi hinceta ku mayin hene, nikarin tevgerê bikin, erka xwe pêk naynin."
El-Dendel, da zanîn ku rêxistin îdayên ne rast dikin û wiha dewam kir: "Dibêjin ku bajarê Reqayê tijî mayîn e. Çawa wiha dibe û Reqa tijî welatî ne. Şêniyên piraniya taxên Reqayê vegeriyane û tax tijî ne. Mayin hatine paqijkirin, lê hin mayinên ku nehatine dîtin hene, lê ew ne li cihên niştecîbûnê ne. Hemû mayinên li ber çavan bûn hatine bêbandorkirin û niha Reqa tijî mirov e."
Endamê rêveber ê Buroya Rêxistinan a Meclisa Sivîl a Reqayê Tirkî El-Dendel di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku Meclisa Sivîl a Reqayê tevî bêderfetiyan jî alîkariya welatiyan dike û bang li hemû rêxistinan kir ku erka xwe pêk bînin û alîkariyê pêşkêş bikin."…*ANHA*



# Em bi hev re li ber îdamê rabin

***Girtiya siyasî ya Kurd Zeynep Celaliyan nameyek ji girtîgehê şand, işaret bi cezayê darvekirinê yê li Îranê kir. Celaliyan bang kir û got, "ez weke girtiyeke ku bi salên dirêj li bin cezayê darvekirinê me, ez daxwazê ji we hemûyan dikim ku em hemû bi hev re li ber cezayê darvekirinê rabin.***



Girtiya siyasî ya Kurd Zeynep Celaliyan nameyek ji girtîgehê şand, işaret bi cezayê darvekirinê yê li Îranê kir û ev bang kir: "Em bi hev re li ber darvekirinê rabin."
Girtiya siyasî ya Kurd Zeynep Celaliyan ku li girtîgeha bajarê Xoyê yê eyaleta Ûrmiyê tê girtin, li dijî darvekirinê nameyek nivîsî.
Nameya Zeynep Celaliyan wiha ye: "Ramîn, Zanyar, Luqman, Kemal û kesên din ku cezayê darvekirinê li wan hatiye birîn, vê nameyê ji bo we dinivîsînim ku xem û êşên me pir in. We jî ew kolber dîtine? Ku ji bo pariyek nan giyanên xwe yê pak didin. Di hemû civakê de kesên ku kar dikin heqdestê wan tê dayîn, lê kolberên Kurd li beramber ew karê ku dikin ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve tên gulebaran kirin. Yan ew dayikên li gel zarokên xwe karkeriyê dikin? Beşek ji vê civakê mêrsalarî ye, dijî jinê ye û jinbûn tenê êş e.
Yan ew jina ciwan a ji bo nîşandana nerazîbûna xwe ya li dijî cudakariyê, li ber çavê tijî rondik ê dayikê agir berda bedana xwe? Yan ew zarokê ji bo peydakirina pariyek nan dixebitin? Ezîzên min, dengê we ji kîjan ji van êşan e? Nizanim ev çi ceza ye ji bo we erê kirine, cezayê Kurdbûna we ye, yan jî mirovdostbûna we ye?
Eger cezayê li dijî stemkariyê darvekirin be, ango ewên ciwanên welatê me bi darvekirinê ceza dikin, divê li kîjan dadgehê werin dadgehkirin û çawa werin lêpirsîn? Gelê hêja yê Îranê û rêxistinên Mafên Mirovan ez weke girtiyeke ku bi salên dirêj li bin cezayê darvekirinê me, li pişt dîwarê girtîgehê van zordaran bû, ez daxwazê ji we hemûyan dikim ku em hemû bi hev re li ber cezayê darvekirinê rawestin. Dayik û bavê van girtiyên siyasî kêfxweş bikin. Werin em hemû bi hev re li ber vî cezayê sedsalên navîn rabin. Ji ber ku bêdengiya me mohra piştgirîkirina cezayê darvekirina Ramîn, Luqman, Zanyar, Hidayet, Kemal û girsiyên din ên siyasî ne."

# Ezê laçika spî ji bo aşitiyê timî bidim serê xwe



Parlamentera HDP'ê Remziye Tosun ji ber ku bi laçika xwe ya spî sond xwar mohra xwe li pêvajoya sondxwarina li Meclîsê da. Tosun diyar kir ku ew ji destpêkê heta dawî şahidê zindî yê şerê li Sûrê ye û wiha got: "Ez şahidê zindî yê hemû qedexe, şer û wêrankirina li Sûrê pêk hat im û ji bo vê jî heta ku ez bijîm dê laçika xwe ya spî ji bo aştiyê bidim serê xwe."
Parlamentara HDP'ê yê Amedê Remziye Tosun ku di serdema şerê Sûrê ya 28'ê Mijdara 2015'an de dest pê kir û 96 roj dewam kir yek ser şahidiya zindî ya qedexeya li ser 6 taxan, şer, kuştin û wêrankirinên pêk hatin kir. Ji ber vê şahidiya zindî li gel pitika xwe 2 meh di girtîgehê de ma û di hilbijartina 24'ê Hezîranê de di Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) de wek parlamenterê Amedê hat hilbijartin û çu Meclîsê. Tosun ji ber ku yekemîn care di Meclîsa Tirkiyê de bi laçika spî sond xwar, mohra xwe li pêvajoya merasîma sondxwarinê da. Tosun piştî ku bi laçika xwe ya spî li Meclîsê sond xwar û vegeriya Amedê, sedemê çûyîna xwe ya Meclîsê ya bi laçika xwe ya spî vegot.

**NESÎHETÊN DAYÎKAN**

Tosûn ji bo sedemê çûyîna xwe ya Meclîsê ya bi laçika xwe û hestên xwe yên di serdema sondxwarinê de ev tişt anî ziman: "Ez qet neketim nav kelecanek, ez di xebat û mîtîngên hilbijartinê yên di nav gel de bêtir diketim nav kelecanê. Ez di wan kêliyan de tenê aştiyê fikirîm, di serdema hilbijartinê de daxwazên jinan ên aştiyê ji hişê min dernek. Nesîhetê dayîkan yên di kampanya hilbijartinê de li min kirin, kelecana di nava çavê zarokan de ji ber çavên min qet neketin."

**LAÇIK ÇANDA ME YE**

Tosun bal kişand ser parvekirinên tora civakî ya li ser piştî merasîma sonda li Meclîse xwarî û wiha gatina xwe bi dawî kir: "Kesên ku wate û girîngiya laçika spî zanibûn xwedî li sonda ku min bi laçik di serê min de xwend derket. Hinekan jê di parvekrinên xwe de digot 'ma tu çuy mewludê?'. Laçıka spî kevneşopiya me ye. Sembola aştiya jinên kurd e. Kî ji ber vê nerihet dibe bila bibe. Ez ê her dem bi laçika xwe ya spî biçim parlamentoyê. Hinekan jî digot ku 'hevîrê xwe bike û here'. Belê emê hevîrê xwe jî biguvêjin, li malê xwarina xwe jî çekin û

# Wê têkoşîna me dewam bike



Jinên Efrînê yên ku di encama êrîşa dewleta tirk û komên girêdayî wê de li Şehbayê bi cih bûne anîn ziman ku ew nawestin û gotin:"wê êkoşîna me berdewam bike."
Jinên Efrînê yên ku di encama êrîşa dewleta tirk û komên girêdayî wê de li Şehbayê bi cih bûne anîn ziman ku ew tu carî bê hêvî nemane û dev ji berxwedana xwe bernedane.
Nehidet Xelîl diyar kir ku berî ku Efrîn were dagirkirin ew bi çandinê mijûl dibû û got: "Berî ku Efrîn ji aliyê dewleta tirk û çeteyên dewleta Tirk ve bên dagirkirin li Efrînê jiyanek wekhev û demokratîk hebû. Jin li wir çalak bûn û bi awayekî azad dijiyan. Ez jî bi karê çandinê mijûl dibûm. Niha em gelek bêriya Efrînê dikin. Em li ser axa xwe bûn koçber. Em hêvî dikin Efrîn ji dagirkeran rizgar bibe."

**TÊKOŞÎNAME WÊ BIDOME**

Naziliye Xelîl anî ziman ku niha li Efrînê jin ne azad in zilm li wan tên kirin û got: "Berî ku dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê Efrînê dagir bikin em wekî jin li wir azad bûn û em bi xebata xwe li ser lingên xwe disekînin. Lê niha jinên li Efrînê yên di bin desthilatdariya çete û leşkerên dagirker de di, bin zext û zordestiyan de, tên çewisandin. Em dixwazin dîsa Efrîn rizgar bibe û em vegerin ser axa xwe. Têkoşîna me didome, em ê bi ser bikevin."

# Em nikarin ji Ocalan agahiyê bigirin

Hevberdevka HDK'ê Gulîstan Kiliç Koçyîgît di 4. Civîna Meclîsa giştî ya Serdema 8. a HDK'ê de bal kişand ser tecrîda li Îmraliyê û got, "Li ser tenduristî û ewlekariya Ocalan em nikarin agahiyê bigirin."



Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) civîna xwe ya çaremîn a meclîsa giştî ya serdema heyştemîn li avahiya navendî ya li Stenbolê pêk anî. Pankarta bi nivîsa "Azadî ji Hevberdevkê me Onûr Hamzaoglû re" li salona civînê hate daliqandin. Hevberdevka HDK'ê Gulîstan Kiliç Koçyîgît di destpêka civînê de axivî û şehîdên Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê bi bîr anî. Koçyîgît destnîşan kir ku têkoşîna berxwedêrên 14'ê Tîrmehê îro jî sedema hebûna wan e.
Koçyîgît diyar kir ku bi sîstema nû re meclîs tevizî ye û parlamenter jî bûne mîna noteran. Koçyîgît bi dewamî got, "Ji bo me ya girîng demokrasiya radîkal e, avakirina meclîsên gel e. Mixabin Tirkiyê demokrasiya xwe ya parlamenter ku kêm jî be hinekî hebû, bi destê xwe tasfiye kir û monarşiyeke nû ava kir."
Gulîstan Kiliç Koçyîgît işaret bi desteya wezîran kir û got, desteya wezîran nîşan dide ku welat wê bi mejiyê şîrketekê were birêvebirin. Koçyîgît got, ne ji desteya wezîran ne jî hikumetê, demokrasî, wekhevî û azadî nayê vî welatî.

**PÊWÎSTÎ BI**

**TÊKOŞÎNÊ HEYE**

Hevberdevka HDK'ê nerazîbûn nîşanî biryara dadgeriyê da ku serkêşê mafyayê Sedat Peker ê gef li akademîsyenên aştîxwaz xwaribû beraat kir. Koçyîgît got, "Mafyayekî bi navê Sedat Peker ji aliyê dadgeriya vî welatî ve hate parastin. Hevberdevkê me yê dilovan Onûr Hamzaoglû ji ber ku daxwaza aştiyê kir, bi mehan e li girtîgehê dîlgirtî ye. Ji bo serkêşekî din ê mafyayê jî rapora tenduristiyê hate dayin û maf jê re hate dayin ku bi awayekî bê sînor karibe hevdîtinan bike. Ev yek radixe pêş çavan bê hiqûq çiqasî binpê bûye. Li hemberî me bêhiqûqiyeke çawa heye? Li ser Birêz Ocalan ê li Girtîgha Îmraliyê tecrîdeke giran heye ku destûr nayê dayin parêzer û malbata xwe bibîne. Ji bilî hevdîtineke malbatê, ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve agahî ji Ocalan nayê girtin. Li ser tenduristî û ewlekariya wî em nikarin agahiyê jê bigirin."
Gulîstan Kiliç Koçyîgît da xuyakirin ku ji bilî têkoşîna li dijî faşîzma tund, rêyeke din li ber wan nîne.
Hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan HDK'ê Gulistan Kiliç Koçyîgît bal kişand ser nîqaşên derbarê îdamê û got, "ev yek wê di heman demê de li ser girtiyên siyasî jî bê ferzkirin." Koçyîgît ji bo rûniştina 19'ê Tîrmehê ya Hevberdevkê HDK'ê Onûr Hamzaoglû û siyasetmedarên din banga tevlîbûnê kir.

# Di MSD'ê de wê guhertin pêk werin

***Kongreya Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê wê di 16'ê vê mehê de were lidarxistin. Endamê Desteya Rêveberiya Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Hikmet Hebîb bal kişand li ser girîniya kongreyê û diyar kir wê bi vê kongreyê guhertinên ku pêşeroja Sûriyê eleqeder bike, pêk werin."***

Hikmet Hebîb diyar kir ku Kongreya 3'yemîn a meclisê wê di 16'ê vê mehê de were lidarxistin û da zanîn ku kongre wê guhertinê di xebatên meclisê yên di hemû aliyan de pêk bîne.
Endamê Desteya Rêveberiya Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Hikmet Hebîb diyar kir ku kongreya wan wê di 16'ê vê mehê de were lidarxistin û ev tişt anî ziman: "Kongreya 3'yemîn a Meclisa Sûriya Demokratîk di nava şert û mercên siyasî û leşkerî yên li Sûriyê de tê lidarxistin. MSD, ji destpêka avabûna xwe de xebatên avakirina projeya demokrasiyê ji hemû pêkhateyên Sûriyê dimeşîne. MSD, sîwana siyasî ya QSD'ê ye ku herêm ji çeteyên DAIŞ'ê paqij kir."
Hebîb îşaret pê kir ku MSD'ê ji destpêka avabûna wê ve û piştî pêkanîna rêgeza demokrasiya nenavendî ya ji bo rêvebirina gelê Sûriyê bû cihê baweriya gelek aliyên siyasî, kesayetên li hundir û derveyî welat û wiha dewam kir: "Xuya kir ku aloziya Sûriyê derbasî pêvajoya şerê siyasî û danûstandinan dibe. Ev şerê siyasî ji bo rêgirtina li ber berjewendiyên hemû aliyan ku berjewendiyên wan li Sûriyê hene bigire, pêk tê."
Hebîb xwe wiha dewam kir: "Kongreya 3'yemîn a MSD'ê wê bi çalakiyên mezin were lidarxistin. Ji ber rewşa hesas û nazik ku Sûriye tê re derbas dibe û ji ber beşdarbûna gelek kesayet, partî û şandeyên ji derve û hundirê Sûriyê , wê rola Kongrê girîng be." Hebîb da zanîn ku wê kongre hemû pêwîstiyên pêvejoya pêşerojê diyar



bike.
Hikmet Hebîb destnîşan kir ku gelek guhertin di rêveberiya meclisê, guhertinên nû di xebatên stretajîk û birêxistinkirina meclisê de wê pêk werin, da karibe bi erkên xwe rabe. Li ser pêvajoya piştî lidarxistina kongreyê, Endamê Desteya Serokatiya MSD'ê Hikmet Hebîb da zanîn ku bi armanca avakirina cebheya demokrasiyê ku hemû gelên Sûriyê dihewîne wê forumeke danûstandinê were lidarxistin... *ANHA*

# Tecrîd gihiştiye asta herî bilind



Parêzer Raziye Tûrgût diyar kir, ji ber ku kiryarên li Îmraliyê li gelemperiya Kurdistan û Tirkiyê hatine belavkirin, bêhiqûqî û tecrîda li girtîgehan di nava 2 salên Rewşa Awarte de gelekî giran bûne û gihîştine asta herî bilind.


**TECRÎD LI HER DERÊ FERZ KIRIN**

Parêzer Tûrgût rewşa li girtîgehan a dema Rewşa Awarte weke belavbûna tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li gelemperiya Tirkiye û Kurdistanê bi nav kir û got, "Bûyerên di dema Rewşa Awarte de diqewimin, belavbûna tecrîda li ser Birêz Ocalan li girtîgehên li gelemperiya Kurdistan û Tirkiyê ye. Piştî ku Birêz Ocalan hate girtin, rejîmeke înfazê ya xweser ava kirin. Ev yek bi demê re li girtîgehên din jî hate ferzkirin."
Raziye Tûrgût da xuyakirin ku vê rewşê sala 2001'ê bi girtîgehên Tîpa F re dest pê kir û wiha dewam kir: "Bi Tîpa F re, sîstemeke tecrîdê hate avakirin. Dewletê, girtîgehên xwe yên bi ewlekariya bilind, di hundir de jî ji aliyê civakî ve xiste nava tecrîdê. Bi vê armancê mafê sporê, derketina hewşê û mafê tenduristiyê kêm kir û tecrîd bi vî rengî girantir kir. Bi Rewşa Awarte re ev pêkanîn girantir bûn. Çawa ku li Birêz Ocalan tê kirin, destûr nehate dayin ku em jî muwekîlên xwe bibînin."

**REWŞA GIRTIYÊN NEXWEŞ GIRAN E**

Li ser rewşa girtiyên nexweş Parêzer Raziye Tûrgût bi bîr xist ku herî dawî di 'pêvajoya aştiyê' de li ser rewşa girtiyên nexweş hevdîtin bi Wezareta Edaletê hate kirin û bi vê wesîleyê girtiyên nexweş birin Metrîsê û ji saziyên tenduristiyê rapor hatin stendin. Tûrgût da xuyakirin ku ev pêkanî piştre hate rakirin û girtiyên nexweş ji wijdanê dozger re hatin hiştin got, "Mesela, kesekî ku her du milên wî nîne û rapora 'nabe ku li girtîgehê bê hiştin' jê re hatiye dayin jî, bi gotina 'endamê rêxistinê ye, kesekî xetere ye' li girtîgehê tê hiştin. Di dema Rewşa Awarte de tiştekî baş ji bo girtiyên nexweş nebû, berevajî vê, rewşa wan girantir bû. Dema dibin girtîgehê û vedigerînin jî li wan didin."

# Leşker ji tirsa nikarin serê xwe rakin



Êrîşên dewleta Tirk ên dagirkeriyê, Kanûna 2017'an li dijî herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê dest pê kirin. Hêzên gerîla jî bi rengekî bêhempa li dijî dagirkeriyê li ber xwe didin û dor li leşkerên Tirk girtine.
Êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê, Kanûna 2017'an dest pê kirin. Meha Nîsanê ev dagirkerî kete qonaxeke nû û hêzên dagirker gihîştin girê Lêlîkanê yê navçeya Sîdekan a bajarê Hewlêrê. Gerîlayên HPG û YJA Starê bi rengekî bê hempa li dijî dagirkeriyê li ber xwe didin û dor li leşkerên Tirk girtine.
Dewleta Tirk a dagirker Kanûna 2017'an bi plana dagirkirina herêma Bradostê derbasî navçeyên Hecîbeg, Kanîreş, Gelî Reş, Gir Sîro, Gundê Bermizê û çend gundê din bû û meha Nîsanê jî êrîşên xwe yên dagirkeriyê berbelavî geliyê Elî Dirêj, Girê Lêlîkanê û Girê Evdalkovî kir. Li hemberî vê dagirkeriyê gerîlayên HPG'ê tenê li Geliyê Elî Dirêj 73 çalakî li dijî leşkerên Tirk pêk anîn. Di encama çalakiyan de 261 leşkerên artêşa Tirk a dagirker hatine kuştin û 42 leşker jî birîndar bûn.

**BALAFIR BOMBEYAN DIBARÎNIN**

Leşkerên Tirk ên dagirker ku nikarin bersivê bidin gerîla û newêrin serê xwe ji çeperan rakin, ji aliyê hêzên gerîla ve hatine doprêçkirin.
Gerîlayên HPG'ê têkildarî rewşa li herêmê axivîn û gotin; "Leşkerên Tirk heta niha ji bejahî ve bi pêş ve neçûne û dewleta Tirk nikare ji bo wan tiştekî bişîne. Ji bejahî ve nikare leşkerên xwe bişîne, lewma tenê bi helîkopteran leşkerên xwe vediguhezîne û mirî û birîndarên xwe radike. Bê navber 3 balafir bi alîkariya balafireke sîxur, li ser herêmê digerin. Leşkerên Tirk jî ji tirsa çalakiyên gerîla nikarin serê xwe ji çeperên xwe derxin. Ew hêzên li navçeyê hatine bicih kirin 2 rojan carekê ji aliyê dewleta Tirk ve tên guhertin.
Dema leşkerên Tirk li çalakiyeke gerîla radest tên, ji aliyê psîkolojîk ve têk diçin. Li aliyê din balafirên şer jî herêmên gundên Lêlîkanê û navçeyên derdor bomebaran dikin. Ji bo welatiyên navçeyê bitirsînin ku li ser mal û milkên xwe biçin, bombebaranê dikin. Gelê navçeyê tevî hemû zextan dev ji warê xwe bernade."
Gerîlayên HPG û YJA Starê her roj li dijî leşkerên Tirk ên dagirker çalakiyan dikin…*ANF*

## Şandeya rewşenbîrên Misrê hat Rojava



Şandeyek ji rewşenbîrên Misrê bi armanca ku rewşa herêmê bişopîne û bi taybetî sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji nêzîk ve nas bike,hat Rojavayê Kurdistanê.
Şandeya ku ji lêkolîner, nivîskar û rojnamevanan pêk tê li başûrê Başûrê Kurdistanê û li Silêmaniyê çû serdana Nûnertiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Rojava.
Rêveberên nûnertiyê şande pêşwazî kirin û li ser sîstema Rojava û şoreşê agahî dan wan. Dr. Cawidan Hesen li ser navê nûnertiya xweseriyê derbarê sîstema rêveberiya Bakûrê Suriyê û şoreşê de agahî dan endamên şandeyê û bi xetên qalin hêmanên pergala şoreşê vegotin.Endamên şandeyê jî gelekî bi baldarî guhdarî agahiyên li ser şoreşa Rojava kirin û diyar kirin ku ew dixwazin şoreşê hîn zêdetir ji nêzîk ve nas bikin.
Şandeya Misrê piştî serdanê derbasî Rojava bû. Şande wê li Rojava wekî mêvan tevlî Kongreya Meclîsa Suriya Demokratîk MSD'ê bibe.



## Îran û Tirkiye bi hêsanî ji Sûriyê dernakevin

Ezîz KOYLUOGLU

Sûriye wê bi kuve biçe wê di van rojan de hinek din jî eşkere bibe. Encamên hevdîtina Pûtîn û Trump wê rewşa Sûriyê hinek din jî zelal bike. Dibe ku rojên despêkê de em encamê eşkere nebînin, lê wê bi demek kurt de gelek aliyên wê eşkere bibin. Lê ji niha ve gelek rewşên ku em bikaribin nirxandinan li ser bikin hene. Ji bo vê rewşa başûrê Sûriyê wê rewşa Sûriyê giştî diyar bike. Li başûrê Sûriyê çi bibû min dinivîsa xwe ya hefta din de hinek nirxandibû. Bi taybet lihevkirina di navbera Erebîstana Siûdî, Urdin, Îmarat, Îsraîl, Emerîka û Rûsya de gelek aliyên wê raxistibû berçavan. Niha mirov nikare li başûrê Sûriyê qala rejîma Sûriyê bike. Mirov dikare di warê leşkerî de hinek qala wê bike. Ev jî ne wek heremê din yên lihevhatina di navbera komê çekdar û Rûsya de bi navbênkariya dewleta Tirk ya dagirker pêkhatin. Rewşa başûrê Sûriyê berovajî wê ye. Li gorî hin rojnameyên Ereb tê gotin ku Rûsya bi lihevkirina bi komên çekdar yên başûrê Sûriyê, wê hebûna xwe li herêmên di bin destê xwe de biparêzin û çekên giran teslîmî Rûsyayê bikin. Dîsa wê rejîma Sûriyê saziyên xizmet û fermî yên xwe li herêmê bicih bike. Lê wê rêveberiya herêmê komên çekdar û meclîsên herêmî bikin. Dîsa Rûsya başûrê Sûriyê kiriye çar beş û rêveberiya leşkerî teslîmî komeke girêdayî Îmaratê kiriye. Ev koma heta niha alîkariya xwe ji Îmaratê digre, di bin mîsogeriya Rûsya, Emerîka û Îsraîl de wê herêmê birêvebibe heta di qada navnetewî de rewşa Sûriyê zelal bibe. Ev lihevhatin li Sûriyê rewşek nû ye. Hêzên esas li ser Sûriyê şer dikirin, bi vê ceribandina lihevhatinê bi serkeve wê li hemû Sûriyê bi rengê cûda bê meşandin. Lê ev jî dide xuyakirin di dema pêş de ji şer zêdetir wê danûstendin bibe rojev. Xuya dike ku him Rûsya, him Emerîka piştî 7 salan şerê li Sûriyê ji bo çareseriyê wê hin gavan bavêjin. Hevdîtina Trump û Pûtîn wê gavên bên avêtin diyar bike. Piştî ku Emerîka li ser DAIŞê êrîşê xwe da destpêkirin, di navbera her dû hêzên cîhanî de lihevhatinek çêbû. Ev lihevhatin li ser herêmên ku operasyonê lê bikin bû. Ji bo wê jî di navbera herdû aliyan de çemê Feratê wek sînorê herdû dewletan be li lihevkirin. Ev lihevhatin heta niha didome. Li Minbic, dîsa Reqa Emerîka derbasî aliyê din yê çeme Firatê buye û Rûsya jî li Dêra Zor derbasî aliyê din yê Firat buye. Ev jî dide xuya kirin di vê mijarê de jî lihevhatinek heye. Berî niha jî min gotibû du dewlet hene li Sûriyê lihevhatina Rûsya û Emerîka diberjewendiyên xwe de nabînin. Yek dewleta Tirk û yek jî Îran e. Daxuyaniyên dawî yên rayedarên wan dewletan yên dawî jî dide xuya kirin ku wê zû bi zû dev ji hebûna xwe ya fizîkî li Sûriyê bernedin. Dewleta Tirk ya dagirker li ser Sûriyê daxwaza axê dike, Îran jî ji bo hîlala Şîî ava bike û şerê li ser xwe lidervî axa xwe bihêle Sûriyê ji bo xwe cihekî stratejîk dibîne. Wê herdû dewlet jî heta ji deste wan were wê hebûna xwe ya niha li Sûriyê bidomînin. Ji bo wê dibe ku muzakereyan jî bikin, dibe şer jî bikin û dibe li dijî siyaseta Rûsya û Emerîka têkevin nava hevkariyê jî. Ev hersê ihtimal jî dibe bibin. Lê xala herî li pêş herdû dewlet jî wê him lidijî hevbin, him jî wê bixwazin hebûna xwe ya li Sûriyê bidomînin. Ger derketina Îranê li Sûriyê ji daxwaza rejîma Sûriyê re bê hiştin, rejîma Sûriyê tu carî vê yekê nake. Dîsa dewleta Tirk ya dagirker jî bi xesteka xwe ji Sûriyê dernakeve. Ji ber herdû dewlet Sûriyê ji bo xwe staretejîk dibînin, bi daxwaza Rûsya jî dernakevin. Lê ya ku herdû dewletan neçarî derketinê bike, hêz e. Dewleta tirk ya dagirker ne bi şer be, yek gav paşde navê je. Ji bo wê jî lihevhatina DYE û Rûsya bibe jî, du kelem li pêşiya wan hene. Gelo wê bikaribin wan keleman li pêş xwe rakin?



# Rê hebe kes naxwaze li Efrînê bimîne

***Gotin têra zilma çete û leşkerên Tirk yên dagirker ku li Efrînê dikin, nake. Malbateke ku ji ber zilm û hovîtiya dagirkeran ji Efrînê revî û xwe gihand Şehbayê behsa kiryarên dagirkeran kir û got, "Li Efrînê guhertina demokrafîk êdî gelek eşkere xuya dibe, weke ku em li bajarekî biyanî bûn. Ger rê vekirîbe yek kes jî naxwaze li Efrînê bimîne."***

Malbateke ji bajarê Efrînê ji ber destdirêjiyên çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker neçar ma ji Efrînê bireve, diyar kir ku ne pêkan e ew di wan mercan de bijîn û xwe gihandin herêma Şehbayê.
Malbatê diyar kir ku ew 4 rojan li ser rê mane û gelek bendên kontrolê yên komên çete xerac ji .wan standine
Welatiya bi navê E.B. li rex hevser û her du zarokên xwe di dema êrîşa dagirker a artêşa tirk û komên çete yên girêdayî wê li dijî herêma Efrînê de neçar man berê xwe bidin Şehbayê û piştî demekê malbat careke din vegeriya Efrînê da ku rê li pêşiya çeteyan bigirin û nehêlin malên wan werin dizîn. Malbatê xwe gihand Efrînê û guman dikirin ku wê jiyana xwe normal li Efrînê berdewam bikin. Lê rewş ne li gorî daxwaza wan bû û nikaribûn tenê mehekê li Efrînê bimînin. Di encamê de careke din neçar man ji Efrînê derkevin û berê xwe careke .din dan ehbayê

**MÎNA BAJAREKÎ BIYANÎ BÛ**

E.B. girêdayî vegera wan a Efrînê de diyar kir ku ew di bendên kontrolê yên artêşa tirk û komên çete yên girêdayî wê re derbas dibûn û li hemû bendên kontrolê ew rastî gotinên kirêt dihatin û xerac ji wan distandin da ku derbasî Efrînê bibin û wiha got: "Li bajarê Efrînê çete bi awayekî zêde li her derê belav bûbûn û guhertina demografîk li Efrînê eşkere ye. ".Wekî ku em li bajarekî biyanî bûn
E.B. destnîşan kir ku welatiyên Efrînê yên ku vedigerin malên xwe rastî pirsgirêka desteserkirina malên xwe tên û malbatên ku komên çete û artêşa tirk li şûna wan bi cih kirine dernakevin û eger ji van malbatan were xwestin ku ji malên Efrîniyan derbikevin gefa .talan û wêrankirina malan dixwin

**ÇETE HEV DIKUJIN**

Girêdayî rewşa ewlehiyê di bajêr de E.B. da zanîn ku ewlehî li bajarê Efrînê bi temamî tune ye û wiha got: "Rewşa li Efrînê metirsîdar e.



Çete hevdu dikujin û tevliheviyê li ".bajêr derdixînin
Girêdayî destdirêjiyên komên çete E.B. ragihand ku artêşa tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê bi zanebûn tirs û xofê di nava welatiyên Efrînê de belav dikin û rojane bi ser malên Efrîniyan de tên û di bin hincetên cuda de welatiyan direvînin. E.B. got ku gelek jin û zarok û temen mezin jî hatine revandin û çarenûsa piraniya wan .hê jî nehatiye zanîn

**ME TEHEMÛL NEKIR**

E.B. di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ji ber destdirêjiyên rojane yên leşkerên tirk û çeteyên girêdayî wan êdî nema ew dikarin rewşa li Efrînê tehemul bikin û careke din neçar man vegerin Şehbayê û wiha got: "Em 4 rojan li ser pêyan dihatin. Me xwe li çol û çiyayên Efrînê da û em gihiştin ".Şehbayê
E.B. wiha dawî li axaftina xwe anî: "Eger rêya Şehbayê ji welatiyên Efrînê re vekirî be tenê welatiyekî Efrînê li wir namîne."…*ANHA*

# Heta êrîş hebin wê berxwedan jî hebe



Ciwanên Başûrê Kurdistanê ji gelek navendan çûn Qendîlê û serdana mertalên Zindî kirin, piştre jî çûn serdana Şehîdgeha Mehmed .Karasungur
Ji bo beşdarbûna çalakiya bîranîna 'Berxwedana Zîndanê ya 14'ê Tîrmehê ya Rojiya Mirinê' ji gelek navendên Başûrê Kurdistanê ciwan .berê xwe dan Qendîlê
Ji Silêmanî, Helebce, Çemçemal, Mexmûr, Raperin, Kerkûk û çend navendên din ciwan çûn Qendîlê û serdana çalakiya Mertalên Zindî ya ku 36 roje li dijî dagirkeriya dewleta Tirk .didome, kirin
Ciwanên Başûrê Kurdistanê ji aliyê ciwanên enternasyolîst ên Spanya û Swîsreyê ku ji berî 3 rojan çalakî dewir girtin ve hatin pêşwazî kirin. Wê ciwanên Spanî û Swîreyî hefteyekê çalakiyê berde-.wam bikin
Piştî ku ciwanan serdana Mertalên Zindî kirin, li herêma kon lê hatiye vedan, govend gerandin. Piştre ciwan bi gelê Binarê Qendîlê re bi karwanekî çûn Şehîdgeha Şehîd .Mehemed Karasungur ziyaret kirin
Li ser navê Mertalên Zindî Tolhil-.dan Zîlan daxuyanî da
Daxuyanî wiha ye; " Zilm, dagirkerî û êrîşên dewleta Tirk di ti deman de, berxwedan û îradeya gelê Kurd neşikand. Em bang dikin ku her kes li dijî dagirkeriyê tevlî têkoşîn û berxwedanê bibe. Weke ciwan me bi rihê berxwedana 14'ê Tîrmehê li Qendîl li dijî dagirkeriyê dest bi çalakiya mertalên zîndî kir.
Li cihekê êrîş û dagirkerî hebe, li hemberî wê berxwedan jî heye. 36 roje em li dijî dagirkeriyê berxwedanek mezin dikin. Bi ruhê 14'ê Tîrmehê me soza mezinkirina ".têkoşînê didin

# Xwepêşandanên li Iraqê berdewam dikin



Xwepêşandan û aloziyên li parêzgeha Besrayê destpê kir, li Bexda, Necef, Zîkar û Kerbelayê berdewam dike û têgotin ku wê pêla xwepêşandanan li herêmên din jî belav bibe. Serokwezîrê Iraqê ji bo dawî li xwepêşandanan were diyar kir ku ewê 3.5 milyar dolar bûdce ji .bo van herêman veqetînin
Ev zêdeyî hefteyeke niştecihên parêzgeha Besrayê bi sedema kêmbûna ceyran û xizmetguzariyê di xwepêşandanê de ne. Ev çend roje xwepêşandan berbelavê parêzgehên din yên Iraqê jî bû. Li paytext Bexda (Meydana Tehrîr), Besra, Mîsan, Necef, Kerbela û Zîkarê xwepêşandan berdewam dike û tê gotin ku dibe li .parêzgehên din jî belav bibe
Li Kerbela û Besrayê xwepêşander ser avahiya Walîtiyê de girtin û di encamê de alozî di navbera hêzên ewlekarî û xwepêşanderan de .derket
Li ser zêdebûna aloziyan Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî serdana Besrayê kiribû û bûyeran di cih de şopandibû. Li gorî ragihandinên Iraqê, Ebadî 3 milyar û 500 milyon dînar bûdce ji bo pêwîstiyên parêzgeha Besrayê veqetandiye. Her wiha têgotin ku Ebadî fermandaye ku parzûngeha avê û xizmetên tendûristiyê jî ji bo herêmê pêk .bînin
Her wiha hinek ragihandin jî îdîa dikin ku artêşa Iraqê hêzên ewlekariyê ji Kerkûkê vekişandiye, ji bo sewqê parêzgehên alozî lê hene .bikin
Heya niha bi sedan kes di van xwepêşandanan de birîndar bûne û hêzên ewlekariyê li hemû parêzgehên Iraqê hatine bi cih kirin. Di heman demê de li hinek parêzgehên ku alozî lê derketine qedexeya derketina derve hatiye .ragihandin

# Gelê kampa Mexmûrê şehîdên 14'ê Tîrmehê bibîranî



Li Saziya Malbatên Şehîdan ya Wargeha Mexmûrê bi merasîmekê bîranîna 14'ê Tîrmehê hate lidar-.xistin
Li Saziya Malbatên Şehîdan ya Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî, Şehîdên 14'ê Tîrmehê hatin bîranîn. Li ser wateya rojê ji aliyê Rêveberê Wargeha Mexmûrê .Mustefa Cizirî ve axaftin hat kirin
Rêveberê Wargeha Mexmûrê Mustefa Cizirî bal kişand li ser avabûna partiyê û şehadeta Şehîdên 14'ê Tîrmehê û got: "Îro roja berxwedana îradeya mezin, berxwedana Îdeolojîk, berxwedana kesayetên mezin yên weke Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Alî Çîçek ku li himberî dagirkeriya dewleta Tirk û cûnta 12'ê Îlonê şerê hebûnê dabûn destpêkirine. Ji ber wê ruhê 14'ê Tîrmehê,ruhê şoreşa me ye. Wek Rêbertî jî dibêje 'Kemal Pîr û Mehmed Xeyrî Dûrmûş ruhê min yê veşartî bûn' li gel wan hevalan yên din jî pêşeng bûn. Van hevalan li himberî faşîzmê berxwedaneke mezin kirin."
Cizîrî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Îro jî faşîzim heye wek heval Hakî Karer gotî 'me bi şeşan destpê kir û me bi şeş hezaran berdewam kir, niha ji gihiştiye milyonan.' Niha jî her çiqas şert û merc nebaş bin lê pêwîste ji her wextî zêdetir em li himberî dewletên dagirker û faşist li ber xwe bidin û xwedî li nirxên xwe û şehîdên ".xwe derbikevîn
Piştî axaftinan filmê 14'ê Tîrmehê .hat temaşekirin

## Hevdîtina Trump û Putin



Burhan ERDEM

Û roja hevdîtina herî dihate payîn a ji bo cîhana me hat. Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA)yê Donald Trump û Serokê Rûsyayê Vladmir Putin di zîrveyekê de tên cem hev. Berê jî, par di dema Lutkeya G-20'an de li Hamburga Almanyayê piştî wê jî, Li zîrveya aborî ya Asya-Pasîfîk de, herdu lîder li Vîetnamê hatibûn cem hev. Lê ev herdû civînên wan, bi muqayesekirina ya roja me, ne ewqasî girîng bûn.
Bajarê Helsînkî yê Fînlandiyayê, wê weke gelek carên din, ji vê civîna hêzên super ên cîhana me re malovaniyê bike. Ne bi qasî ya Reykjavikê be jî -ku hingê cara pêşiyê di navbera Ronald Reagan û Mîkaîl Gorbaçev de, civîna van welatan pêk hatibû-, ev civîna li Helsînkiyê, wê bibe civîneke ku dîrokê biguherîne.
Donald Trump ji civîna NATO'yê derketiye û li Îngilîstanê bêhna xwe vedaye. Heta divê mirov bibêje, li Îngilîstanê serkeftina xwe ya bidestxistina piştgiriya Ewrûpiyan pîroz dike. Trumpê hê di riya Brukselê de bû, berê xwe dabû welatên Ewrûpî û ji ber dayina kêm a pereyên ji bo NATO'yê, wan rexne kiribû. Civîna, NATO'yê di atmosfereke tengezar de destpê kiribû û heta dawiyê jî bi vê hewaya giran derbas bûbû. Trump, Almanya bi bûyina êsîra Rûsyayê sûcdar kiribû. Gotibû, em destekê didine wê, wê diparêzin, lê ew diçe enerjiyê ji Rûsyayê dikire. Trump endamên din jî di mijara lêçûnên aborî yên NATOyê de bi pêkneanîna wezîfeyên xwe rexne kiribû û di encamê de, hemû welat mecbûr kiribû ku ji %2 yê hatina xwe ya neteweyî, ji bo NATO'yê xerc bike.
Trump di axaftinên xwe yên li civîna NATO'yê de bahsa hevdîtina xwe ya bi Putin re jî kiribû. Ji gotinên wî hatibû famkirin ku, lihevkirinek peyda bûye. Bi taybetî li ser nêzîkatiya Rûsyayê ya ji bo Îranê, alî nêzîkî hevdû bûne. Di warê vekişîna hêzên wê yên ji Sûriyeyê de û hwd. Jixwe rojnameyên Amerîkî û Îsraîlî nivîsandin ku, birrîna aleqeya Îranê ya bi Sûriyeyê re şertê yekemîn e ku Trump ji bo vekirina kanalên dîplomasiyê daniye pêşiya Rûsyayê. Di van kanalên dîplomasiyê de tişta ku gelekî li ser tê rawestîn, naskirina Kirimê ye ku bi ser Rûsyayê ve hatiye girêdan. Ji ber vê yekê Rûsya di bin ambargoyeke giran de ye û pêşiya ticareta Rûsyayê ya bi Ewrûpiyan re digre. Dawetkirina Ûkraynayê ya ji bo zîrveya NATO'yê jî îşareteke di vî warî de bû. Dîsa di devên lîderên welatên endam û Sekreterê Giştî yê NATO'yê de, gotinên nexweş ên ji bo Rûsyayê hebûn. Bi gotinên ji dema "şerê sar" mayî, sûcdariyên li rêveberiya Moskovayê dihatin kirin jî, ketin nava belgeyên zîrveya vê rêxistina Hevkariya Bakurê Atlantîkê. Vana weke mînak, zêdekirina çekên nuklerî yên Rûsan û bihêzbûna wê ya çekdarî ya li deryaya reş û deryaya sipî bûn. Dîtina sereke ya li cem pisporên Amerîkî ew e ku, ji bo bêtesîrkirina Îranê ya li Rojhilata Navîn, divê desteka Rûsyayê kêm bibe. Riya vê yekê jî ji Şamê derbas dibe. Bêbandorkirina Îranê ya li Şamê, ji Lubnanê heta Yemenê, wê tesîra xwe li herdeverê bike. Di vî warî de jî Îsraîlî pêşengiyê dikin ku li cem Washingtonê destê wan xurt e. Di bingeha xwe de jî, bêhêzkirina Îranê ya li Sûriyeyê, tê wateya parastina Îsraîlê.